# Çalakiyên ji bo temamkirina li malê

## Agahdarî ji bo dê û bav û çavdêran

Ji bo bihêzkirina tiştên ku li dibistanê hîn dibin dê zarokê we çalakiyên ku dixwazin li malê temam bikin bistînin.

Zarokê xwe teşwîq bikin ku ew çalakiyan biqedînin û bi wan re li ser karê wan biaxivin. Bi vî awayî piştgirîdayîna zarokê xwe, têgihiştinekê dide we ku li dibistanê çi fêr dibin û nîşanî wan dide ku hun qîmetê didin perwerde û fêrbûnê.

Temamkirina çalakiyên li malê wê firsendê bide zarokê we:

- ji nû ve tiştên ku li dibistanê fêr bûne sererast bikin,
- têgihîştin û behreyên wan xurt bikin,
- hunerên xwendinê bi pêş bixin ku ew ê heta dawiya jiyana xwe de bi kar bînin.

### Li malê adetên baş ava dikin

Edetên wan ên baş hene, dê di seranserê dibistana xwe û jîyana kar de alîkarîya zarokê we bike.

- Ji bo qedandina çalakiyan demeke rêkûpêk eyar bikin -divê ev her roj bibe heman wext.
- Ji bo zarokê we demeke ku herî baş dixebite hilbijêrin (hin zarok sibehê baştir balê dikişînin ser xwe, hinek jî piştî nîvro).

Heger cihekî wan ê rehet hebe dê zarokê we pir hêsantir bibîne.

- Ji bo ku zarokê we tê de bixebite cihekî bêdeng û xweş bibînin.
- Tiştên ku pêdiviya wan bi wan heye yên wekî pênûs, kaxez an jî kompîturê hebin.
- Cihekî ji mijûlbûnê bêpar (mînak, dûrî televîzyon an jî lîstikên kompîturê) bibînin.

### Ez çawa dikarim alîkarîya zarokê xwe bikim?

- Meraqdar bin û li ser ew çi dikin pirsan bikin.
- Ji wan bixwazin ku tiştên ew fêr dibin hînî we bikin.
- Kontrol bike bê ka pêdivîya wan bi alîkarîyê heye yan na.
- Ji ber ku hewl didin çalakiyê biqedînin û hewldanên wan biqedînin, pesnê wan bidin.
- Ji mamoste bixwazin ji bo xwegihandina çavkanîyên heyî yên ku piştgirîya dê û bavan û çavdêran dikin.

Ji bîr nekin, temamkirina çalakiyên li malê divê ji bo zarokê we bibe tecrûbeyeke erênî.

Eger ji bo qedandina çalakîyan pêdivîya zarokê we bi alîkarîyeka zêde an jî eyarkirinên taybet hebe, mamoste agahdar bikin.

### Xizmeta wergerandina li ser telîfonê

Heger pêdivîya we bi alîkarîya wergêran hebe ji bo ku hun bi dibistanê re bikevin têkiliyê, ji kerema xwe telîfonî 131 450 bikin, ji opêretorê re bibêjin bê ka pêdivîya we bi kîjan zimanî heye û ji wan bixwazin ku telîfonî dibistanê bikin. Ji bo alîkarîya we, opêretor dê wergêrekî li ser xetê bistîne. Ev xizmet blaş e.